# Guherîn li qanûna biyaniyan ji 1/6 ve – tesîrê li mişteriyên parastina navneteweyî dike

Qanûna biyaniyan ji 1/6/2025 ve diguhere. Guherîn tesîrê li te dikin eger dawa penaberiyê dikî yan xwedî parastina navneteweyî yî li Fînlandayê. Qanûna nû yekser piştî dema destpêkirina wê tê bikaranîn.

## Di hevpeyivîna penaxwaziyê de lêpirsînname dikare tenê beşek jî were pêdeçûn

Di hevpeyivîna penaxwaziyê êdî piştî 1/6 ne hewce ye ku hemû lêpirsînname ji destpêkê heta dawiyê were pêdeçûn. Anku karmendê Daîreya Koçberan di hevpeyivînê de hemû lêpirsînnameyê bo te naxwîne. Ev demê diparêze û meşandina dawa penaxwaziyê ji mişterî re jî bileztir dike.

Hevpeyivîn ji niha ve jî bi deng tên qeydkirin. Eger lêpirsînname di hevpeyivînê de bi temamî neyê xwendin, dê rojeke diyarkirî bidin te ku dikarî zêdekirinan yan verastkirinan bişînî.

## Nikarî bi belgenameya seferkirinê ya penaberan yan bi pasporta biyaniyan sefer bikî welatê xwe

Piştî guherîna qanûnê, êdî nikarî sefer bikî welatê xwe, anku dewleta xwe yan welatê ku berê bi daîmî lê bûyî, bi belgenameya seferkirinê ya penaberan yan bi pasporta biyaniyan.

Guherîn dikare tesîrê li te bike eger

- penaberekî kotayî bî
- mafê te yê penagehî hebe
- te îqame li ser bingehê parastina duyem wergirtibe
- te li ser bingehê têkiliyên malbatî îqame wergirtibe û te biryareke erênî bo parastinê wergirtibe
- te îqameyek heye li ser bingehê qedexeya vegerandinê (îqameya li ser bingehê qanûna biyaniyan madeya 89).

Dikarî belgenameyeke seferkirinê ku mafê seferkirina bo welatê te bide ji Daîreya Koçberan tenê ji ber sebebeke bi taybetî giring wergirî. Sebebeke wiha dikare bo nimûne xweşketina ciddî ya kesekî nêzîk yan dawakirina cudabûnê be. Zêdetir agahiyan bixwîne ji malperên Belgenameya seferkirinê ya penaberan û Pasporta biyaniyan

### Eger sefer bikî welatê xwe, Daîreya Koçberan dikare wisa fem bike ku tu êdî ne hewceyî parastina navneteweyî yî

Di qanûna biyaniyan de tê nivîsîn ku eger xwedî mafê penaberiyê yan parastina navneteweyî ya duyem bî, seferkirina te y abo welatê te dikare wek sebebek hilweşandina

parastina te ya navneteweyî were hesabkirin. Seferkirina bo welatê xwe berê jî dibû bibe sebebê hilweşandina parastinê.

## Bicihanîna derxistinê jî dibe wek awayê vegerandinê

Piştî guherîna qanûnê ya 1/6 bicihanîna derxistinê jî dibe wek awayê vegerandinê di mijarên parastina navneteweyî de û ji mijarên din yên îqameyan tê cudakirin.

Dikarî bo nimûne biryareke derxistinê wergirî eger berê li Fînlandayê bi îqameyeke din mabî û te biryareke neyînî li ser dawa xwe ya penaxwaziyê wergirtibe.

Biryara derxistinê tê wê maneyê ku divê ji Fînlandayê derkevî wek ku di biryarê de hatiye ragihandin. Dema bicihanîna biryara derxistinê diguhere li gor wê yekê ka gelo dawa te bi zelalî wek bêbingeh hatiye hesibandin yan nehatiye lêkolîn. Polîs ji bicihanîna biryara derxistinê berpirsiyar e.

Zêdetir bixwîne ji rûpelên Betalkirina mafê penaberiyê û parastina navneteweyî û Vegerandin, derxistin û qedexekirina hatina welat.

## Dikarin li şûna mafê penaberiyê, parastina pileya duyem bidin te eger te dawayeke nû li ser hinek sebeban kiriye ku te bi xwe kirine

Dikarin li şûna mafê penaberê, parastina pileya duyem bidin te eger dawayeke nû bikî li ser hinek sebeban ku te bi xwe kirine piştî wê yekê ku tu ji welatê xwe yan ji welatê bicihbûna xwe ya daîmî reviyayî.

Dikarî parastina pileya duyem wergirî eger şertên mafê penaberiyê bicih neyên. Dikarî zêdetir bixwînî ji rûpelên Dawakirina nû û Parastina pileya duyem.